

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



# BOOKS PUBLISHED IN 1981-1986

*Gunilla Bergström*

**Alfons û cinawir**

ALFONS OCH ODUJURET  
Alfie and the monster  
ISBN 91 86146 009

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Keça şerrût Lotta**

LOTTA PÅ BRÅKMAKARGATAN  
Lotta at the Bråkmakargatan  
ISBN 91 86146 017

*Astrid Lindgren & Ingrid Nyman*

**Pippi ya goredirêj**

KANNER DU PIPPI LÅNGSTRUMP?  
Do you know Pippi långstrump?  
ISBN 91 86146 068

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Belê Lotta kare bajo**

VISST KAN LOTTA CYCKLA  
Of course, Lotta can ride a bike  
ISBN 91 86146 033

*Gunilla Bergström*

**Ma tu tirsonêk î Alfons Aberg?**

AR DU FEG ALFONS ÅBERG?  
Are you coward Alfie?  
ISBN 91 86146 05 X

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Binêre madîkan, berf dibare**

TITTA, MADICKEN, DET SNÖAR  
Look, Madicken, it is snowing  
ISBN 91 86146 11 4

*Lennart Frick & Jean Carlbrand*

**Ma gakûvî kûçîkan dixwin?**

ATER ALGAR HUNDAR?  
Do clogs eat dogs?  
ISBN 91 86146 09 2

*Bengt Arne Runnerström*

**Arhuaco - Sierra Nevada**

ARHUACO - SIERRA NEVADA  
Arhuaco - Sierra Nevada  
ISBN 91 86146 16 5

*Gunilla Bergström*


**Şev baş Alfons Aberg**

GOD NATT ALFONS ÅBERG  
Good night Alfie  
ISBN 91 86146 17 3

*Petra Szabo*

**Emil, miha nîvçe**

EMIL, DET HALVA FÄRET  
Emil, the half sheep  
ISBN 91 86146 19 X



Kurdîska Kulturforlaget  
BOX 161 39  
103 23 STOCKHOLM / SWEDEN  
Postgiro 79 05 24 - 3  
Bankgiro: 137 - 8538 ( Företagsbank )

*Inger & Lasse Sandberg*

**Kino digot, li wê derê binêre**

TITTA DAR, SA PULVRET  
Look there, said Dusty  
ISBN 91 86146 08 4

*Inger & Lasse Sandberg*

**Kino digot, alfikarî bikim**

HJALPA TILL, SA PULVRET  
Help, said Dusty  
ISBN 91 86146 07 6

*Gunilla Bergström*

**Alfonsê şît**

LISTIGT, ALFONS ÅBERG  
Crafty, Alfie  
ISBN 91 86146 10 6

*Astrid Lindgren & Björn Berg*

**Gava Rindikê şûmiyan bike**

NAR LILLA IDA SKULLE GÖRA HYSS  
When little Ida got up to mischief  
ISBN 91 86146 14 9

*Gunilla Bergström*

**Kî Alfons rizgar dike?**

VEM RADDAR ALFONS ÅBERG?  
Who saves Alfie?  
ISBN 91 86146 13 0

*Zacharias Topelius & Veronika Leo*

**Sampo lapecan**

SAMPO LAPPELILL  
Sampo Lappelill  
ISBN 91 86146 12 2

*Margareta Ekström & Petter Petterson*

**Pisîngê ku wenda bû**

KATTEN SOM FÖRSVANN  
The cat that disappeared  
ISBN 91 86146 15 7

*Lennart Hellsing & Sven Otto S*

**Kundirê helez**

DEN UNDERBARA PUMPAN  
The wonderful pumpkin  
ISBN 91 86146 18 1

*Inger & Lasse Sandberg*

**Bavo, were derve**

PAPPA, KOM UT!  
Daddy, come out!  
ISBN 91 86146 20 3

*Astrid Lindgren & Björn Berg*

**Şûmiya Zîrek ya hejmar 325**

EMILS HYSS NR 325  
Emil's prank number 325  
ISBN 91 86146 21 1

**Weşanxana Çanda Kurdî**

"ZAROK FÊKIYÊ MALANE"



HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND

ÇÎROK Û MESELÊN XWE

JI WERE BÊJIN

KULÎLK

Çîrok : KAR, GÎSK Û NERÎ  
Werger: Bavê Hêvî



Hebû tunebû,karek,êfskek û nêriyek he-  
bû.Rojek ji rojên biharê,her sê derdikevin  
derve û berê xwe didin berpalekî.Ew dine-  
rin,ku li aliyê din mêrgek şin û gîhayekî  
xweş heye.



Her sê heval berê xwe didin jêr û tîn  
perê çemekî. Mêrge li wiyalî çem e. Dilê  
wan bê hemd dibijya wî gîhayê şîn.  
Li ser wî çemî, pirek ji teht û daran he-  
bû. Di bin wê pirê de, Dêwekî gelek nexweş-  
ik dima. Kesek nevêribû ji tirsê wî Dêwî  
di ser wê pirê derbas biba. Gava dengê an  
pêjnek dihat Dêw, ew ji bin pirê derdiket  
û ew dixwarin.



Tirsek mezin ket dilê her sê sewalan,  
gava ew Dêw dihat bîra wan. Li wan, ji bo  
wê gîhaya şîn û xweş jî can didan.

Piştî bîhnekê karê got:

-Ez dixwazim berê ez di ser pirê der-  
bas bibim.

Tep, trep, tep, trep, tep.....





Dengê meşa karikê çû guhê Dêw. Dêw ji bin pirê derket , bû hib-hiba wî û kire qêrîn:

-Ew kî ye? Li ser pira min dike tep-rep.

Devê karika reben ket tev û bi zorê bi dengekî tenik li Dêw vegerand:



-Ezz,ezzz,ez im.Karikek bi çûk im. Ez dixwazim derbasî wiyalî bibim,çêrê bixim û qelew bibim.

Dêw bi dengekî bilind û bi heybet got:


-Ez nuha tîm û te dixwim...

Kariki bi dengekî belengazî got:

-Oh,na ! Ez ketim bextê te,min nexwe. Ez hîn pir bi çûk im û neqelew im.Li benda gîskê bimîne,ew ji min mezintir û qelewtir e.



DI NAV NEH RESMAN DE DUDU WEKHEVIN.  
MA HUN DIKARIN WAN BIBÎNIN?



## QUNCIKA DÎROKA EDEBYETA KURDÎ

### XARIS BITLÎSÎ (1)

Xaris Bitlîsî di sala 1758 da ji dayika xwe bû ye. Lê nayê zanîn, ku kîja salê çûye ser heqîya xwe.

Bi gotina A. Jaba û M. B. Rûdenko, Xaris Bitlîsî du destan nivîsî ye: Destana "Usib û Zelîxe". û "Leyla û Mecnûn".

Dastana "Usib û Zelîxe", pêşî ji alî Salim Sulêman (sedsalîya xviii) hatiye nivîsandin. Xalis Bitlîsî xeberên erebî û farsî jê neqandî ye û ew pak kirî ye.

Bi gotina A. Jaba di qurnêd XVII-XIX da li medresên nav kurdan de nivîsara Xaris Bitlîsî "Usib û Zelîxe" dixwandin, ji bo zimanê nivîsara wî pak û temîz bû. Ew rind dihat fehmkirin.

Bona ku xwendevanên me haj ji yekitî û cudatî yan Selim Sulêman û Xaris Bitlîsî li destana "Usib û Zelîxê" da hebin, ez çend nivîsarên wan, li jê rê hemberî hev

dikim.Ew rêz min ji nivîsara M.B.Rûdenko  
derxistine (58-50) (Prof.Qanatê Kurdo -  
Tarixa Edebeyeta Kurdi 1)

JI DASTANA SELÎM SULÊMAN

*Ema bi sedat û bi envan  
Besê bikin em ji pîrê Kenan,  
Ev reng ji axretê di mezherî,  
Yûsif bi cemal bûye meşhurî.*

*Xûna xwe ji bo mêra beyan ke  
Te qerîr bike li me eyan ke  
Yaqub hebû keçekî xebersaz  
Wextê ji pîder bihist ev raz  
Beyt bi mera kuh û deştan  
Reh şihbetê teyrekî bihiştan*

JI DASTANA XARIS BITLÎSÎ

*Ema bi sedat û bi envan  
Besê me dikin ji pîrê Kenan,  
Ev reng ji lawê wî di mezherî,  
Usif bi rindî zehf bû meşhurî  
Xûna xwe ji bo mêran beyan ke,  
Tu bibêje ji mira li min eyan ke  
Yaqub wî hebû qîzekî pak  
Wextê ji bav bihist ev dak  
Beyt bi mera çîya û deştan  
Teşbiyê teyrekî bihiştan.*

Li sala 1965 M.B.Rûdenko têksta dest-nivîsên Xaris Bitlîsî ya "Leyl û Mecnûn" bi tîpê rûsî û pêşgotina xwe çapkir. Li pêşgotinê da wî nivîsîye, ku Xaris Bitlîsî li sala 1758-59 da dastana xwe "Leyl û Mecnûn" nivîsîye, ku ewî ew destan bi xwestika keçeke kurd hûnandiye. Derheqa wê da ewî li despêka nivîsara xwe da gi-lîyên jêrîn nivîsîne :

*El-qise di vê behara gilhêz,  
Ez bûm li nivê yekî dilavêz,  
Rûniştim û ez li pencereyê,  
Fikirîme seharê û hewayê.*

*Niga mi di derî kişa bû,  
Şimsik ji nivê mineala bû,  
Ji evelva silam û merheba kir,  
Pirsa me kir, û dilê mi şa kir,  
Rûnişt û bi leb kerem mesref,  
Exbar û qise kirin mesref,  
Esrâf kirin ji ber kilamê,  
Behsa me gihîşte vê miqamê,*

*Ku şêr û wezin çî xweş kilamin,  
Meqbûl cemi'e xas û a'min,  
Nasil li me kir kemal teglîf,  
El-hah û tesleffek bitesif,  
.....*

*Pirsî me wê miraz meknûn,  
Got tercima kî ji "Leyl û Mecnûn",  
Kûrdî tu ziringî da bizanin,  
Lo em çî bi farsî nizanîm.*

(Dûmahîk heye

WAN HEJMARAN YÊKO-YÊKO BIGIHÎNIN HEV



P Ê Z A N Î N

Pirs: 1

Him şil dike,  
Him diwêr qul dike.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 2

Sivê çar linge,  
Nîvro du linge,  
Evarî sê linge.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 3

Oda şuştî-muştî,  
Cotê qazî têda rûniştî.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 4

Du xuşkê cînar,  
Ji hevdu nakin bawer.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....



# M I J Û L Î



Di nav herdu resman de, 5 tişt newekhevin.  
Ma hun dikarin wan bibînin ?

PEYVÊN PÊŞÎYAN

41"Kuro, bibêhn e?"

"Devîya ku parr min jê kir bibêhn bû!"

42"Kevir li cihê xwe giran e!"

43"Kesadî dike fesadî!"

44"Heqê bizina kol namîne li ser  
bizina 1strûdar!"

45"Qedrê zêr, zêker dizane!"

46"Her teyr bi refa xwe ra!"

47"Xiyalê birçi her nan e!"

48"Nefs babet e, cil nobet e!"


49"Bi xwekirin derman tune!"

50"Navê gur bi gazî derketîye!"

51"Piranî birîye mêranî!"

52"Teyrê ku goşt dixwe nikula wi  
gêr e!"


NAVÊ VAN HEYWANAN LI BÎNE WAN BINIVÎSIN



.....



.....




.....



.....



.....



.....

Note Nivîs:  
Cemîla Celîl

QUNCIKA MUZÏK Ê

---

EZ NE DÎNIM 25.


*Allegro*



Ez ne dî - nim ne di - rus - tim,  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dî - nê

Ez ne dînim, ne dirustim.  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dînê.  
Ez ne dînim, ne hahame,  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dînê.  
Ser xanîngê we p'al dame,  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dînê.  
Ç'e'vbelek ç'e'va wez t'evdame,  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dînê.  
Ser xanîngê we diwastim,  
Hay lê, lê, hay lê, lê, hay lê, lê, dînê.

RÊYA RAST BÎBÎNÎN!



# QUNCIKA BAJARÊN KURDÎSTANÊ

## QEREKOSE (AGIRÎ) (3)

RÛNÎSTEVAN Û ABORÎ : Ji axa Qerekosê, me-  
rov dikare ji sedî 20-an (%20) bajo û çan-  
diniyê bike. Bi piranî genim û ceh tê çand-  
in. Pincar jî li hinek cîyan tê çandin. Fê-  
kîyên kû li derdora çeman-avan çêdibe, bi  
zor têra bajêr dike.

Xwedîkirina heywanan gelek pêşketiye û  
gelek malbat derbasbûna wanî aborî li ser  
xwedîkirina heywanaye. Îro ne li Kurdîstanê  
tenê li hemû Tirkîyê, cê herî pir heywan lê



tê xwedîkirin **Vêderê** ye. Piranî van heywanan difroşin dewletên din. Tev wê jî goşt û şîr zêde ye. Heywanên herî pir tîn xwedîkirin mîh û bizinin. Ga û çêlek jî gelek in. Mêşê hingiv û hingiv jî yek ji debara rûniştvanan ye. Hingivê Eleşkirt gelek bi nav û deng e.

Ji alî endûstrîyê de mintîqe gelek li paş maye û elektirîk pir kême. 2 karxanên (fabrîqên) ard û 2 karxanên nan (firinên mezin) henin.

Lê tiştên bi desta tîn çêkirin gelek girîngin: xalîçe, tejik, gorên rîs û lepikên rîs bi nav û deng in.

**RUNIŞTVAN (NUFÛS)**: Rûniştvanên Qerekose qeza û gundan 292.000 e. Serê km<sup>2</sup> ê 24 kes dikeve. Ji bona ku kar tune, gelek runiştvanên Qerekose koçî bajarên metropolê yê mezin (Stenbol, İzmirê, Antalyayê, Edenê...) dikeve. Gelek ji wan jî bo kar bardikin Ewropa....

**TURİZM** : Derdora Qerekose ji alî eserên tarîxî gelek dewlemende. Wekî din jî seyr û temaşa Çîyan û zozanan, ji bo merovê diçin wê herême kêfxweşiyek mezin e. Lê ji ber tu bîngê ji bo turizmê nehatiye çêkirin, ji derve kême kes tîn. Eger ji bo turîsta rê,

Palek Ji çiyayê ARARATÊ





otêl bêçêkirin û propoganda bêkirin, ewê gelek merov ji derve bên vê herêmê...

Eserên herî berbiçav "Girkê Urartûya" ye. Ew girik xwedî tarîxek 3500 salan e. Keleha Beyazîdê jî eserek kevn û girîng e. Dema talankerê Tîmûrling xwest vê kelehê bigre gelek leşker li ser kir û bi ser neket. Ber-mayeke din jî qesra Îshaq paşa ye. Ev qesir 116 odên wê hene û hêjaye merov ji derve temaşa wê bike.


Çîyayê Agirî bi xwe ji bo ger û temaşekirinê cîhekî girînge. Meha tebaxê û îlonê ji bo turîsta cennetek bi serê xweye...

FOLKLOR Û XWARIN : Ji alî folklorêde herêmek gelek dewlemende. Ji alî kinc û cilande bi piranî wekî Qafqasya ye. Lîskên tê lîstin: Bara Agirî û govenda Keç û Xortan...e. Bara Agirî nişana berxwedan û mêranîyê ye.

Ji ber mîh û bizin gelekî, xwarin jî bi piranî li ser goştê wan û şîrê wan e. Xwarina bi nav û deng "Maşil" e. Savara bi goşt û hingivê sipî yê Eleşgîrt gelek xweşin....

-----

NAVE VAN FEKÎ Û ŞÎNKAYAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN




.....



.....



.....



.....



.....



.....


QUNCIKA XEZIKA



QUNCIKA MATEMATİK E

$0 \cdot 2 = \dots$	$0 \cdot 3 = \dots$	$0 \cdot 4 = \dots$	$0 \cdot 5 = \dots$
$1 \cdot 2 = \dots$	$1 \cdot 3 = \dots$	$1 \cdot 4 = \dots$	$1 \cdot 5 = \dots$
$2 \cdot 2 = \dots$	$2 \cdot 3 = \dots$	$2 \cdot 4 = \dots$	$2 \cdot 5 = \dots$
$3 \cdot 2 = \dots$	$3 \cdot 3 = \dots$	$3 \cdot 4 = \dots$	$3 \cdot 5 = \dots$
$4 \cdot 2 = \dots$	$4 \cdot 3 = \dots$	$4 \cdot 4 = \dots$	$4 \cdot 5 = \dots$
$5 \cdot 2 = \dots$	$5 \cdot 3 = \dots$	$5 \cdot 4 = \dots$	$5 \cdot 5 = \dots$
$6 \cdot 2 = \dots$	$6 \cdot 3 = \dots$	$6 \cdot 4 = \dots$	$6 \cdot 5 = \dots$
$7 \cdot 2 = \dots$	$7 \cdot 3 = \dots$	$7 \cdot 4 = \dots$	$7 \cdot 5 = \dots$
$8 \cdot 2 = \dots$	$8 \cdot 3 = \dots$	$8 \cdot 4 = \dots$	$8 \cdot 5 = \dots$
$9 \cdot 2 = \dots$	$9 \cdot 3 = \dots$	$9 \cdot 4 = \dots$	$9 \cdot 5 = \dots$
$10 \cdot 2 = \dots$	$10 \cdot 3 = \dots$	$10 \cdot 4 = \dots$	$10 \cdot 5 = \dots$
$0 \cdot 6 = \dots$	$0 \cdot 7 = \dots$	$0 \cdot 8 = \dots$	$0 \cdot 9 = \dots$
$1 \cdot 6 = \dots$	$1 \cdot 7 = \dots$	$1 \cdot 8 = \dots$	$1 \cdot 9 = \dots$
$2 \cdot 6 = \dots$	$2 \cdot 7 = \dots$	$2 \cdot 8 = \dots$	$2 \cdot 9 = \dots$
$3 \cdot 6 = \dots$	$3 \cdot 7 = \dots$	$3 \cdot 8 = \dots$	$3 \cdot 9 = \dots$
$4 \cdot 6 = \dots$	$4 \cdot 7 = \dots$	$4 \cdot 8 = \dots$	$4 \cdot 9 = \dots$
$5 \cdot 6 = \dots$	$5 \cdot 7 = \dots$	$5 \cdot 8 = \dots$	$5 \cdot 9 = \dots$

X A Ç E P İ R S



P Ê Z A N Î N

Pirs: 1

Hûr hûr barî,

Hey-hey barî,

Deşt û banî,

Her çar alî,

Girt û danî.

Ew çîye ?

Bersîv:.....Berf.....

Pirs: 2

Wêda tê wezîr e,

Rûdinê qisîl e,

Radibe hêsîr e,

Ew çîye ?

Bersîv:.....Berf.....

Pirs: 3

Xare ne dare,





Dimike ne kar e,


Dikşe, ne mar e,

Ew çîye ?

Bersîv:.....Av.....

XACEPIRS (33)















YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr  
BIHA